

Roj bas!

Duh, 10`ê Adarê, Desteya Tenduristiya Gel da diyar kirin ku asta rîska belavbûna enfeksiyonê li Swêdê bi rîskek pir mezin zêde dibê. Ji duh ve, me kesekî ku li wîlayeta Kronoberg bi Convîd-19`ê (Vîrûsa Korona) ketiye teyîd kiri ye. Kesê pê ketiye niştecihê wilayeteke din e, lê niha ji bo wextekî demkî li Kronobergê dimênê. Em dizanin ku di derheqê Vîrûsa Korona de pirs hene û dibe ku di derheqê wê de wekî Serperîştê zarokan/Weliyê zarokan taswasiya we hebê.

Ji bo agahiyên nû tim serdana malpera [www.vaxjo bike](http://www.vaxjo.bike).

Di vê dema ku em niha ji we re dinivîsîn de, di dibistanên me de tu rewşên Vîrûsa Koronayê ku lê rast hatî nebûye. Şaredariya Växjö pêşveçûnê pir bi baldarî dişopîne û li ser malpera me ya www.vaxjo.se bi domdarî agahdariyê nû dikê.

Li ser pirsan em wiha dixebitin

Dibistanên me ji bo ku karibin pêşiya belavbûna enfeksiyonê kêmkirin bikin dixebitin, ji ber ku Vîrûsê din yê wek girîpê jî di tevgerê de ne. Pêşîlêgirtina tevayî ya li dijî enfeksiyona boriya nefesê ewe ku mirov zêde destê xwe nedê rû û çavê xwe û têkildariya nêzîk bi mirovên nexweş re ne deynê ye. Agahdariyên li ser va gavên ku li hemberî Vîrûsa Koronayê werin avêtin zêdetir kirine.

Em ji bo hîjênîyeke baş ya destan serî li [pêşniyariyên Desteya Tendurîstiya Gel dixin](#).

Weke ku tê zanîn Şaredariya Växjö pêşniyarên Desteya Tenduristiya Gel ji berê de perspektîfa parastinê ya belavbûna enfeksiyonê dişopîne û tu sedema ku xwendekarên bi tendurîstiya baş neçine dibistanê û li malê bimînin jî tune ye. Şagirdên li Pêşdibistanê, Dibistana Seretaî, Dibistana Taybet û Lîsayê û yê ku bi tevayî di tendurîstiyeke baş de ne divê herin Dibistanê û beşdarî xwendinê bibin.

Li gorî Desteya Tendurîstiya Gel, xwendekar û karmendên ku li deverên bi rîsk bûne bêyî ku semptomên nexweşiyê heyî pêdiviya ku li malê bimînin nîne, lê divê dîqetî semptomên wek kuxik, zahmetiyên nefes standinê û ta girtinê bikin.

Di rewşa semptomên weha de divê hûn li malê bimînin û bi lênerîna tendurîstiyê re têkiliyê deynînin.